
# Agahî ji bo dê û bav, çavdêr û malbatên zarokên ku ji ber sepsîsê mirine

## Sepsîs çi ye?

Sepsîs çêdibe dema ku laş bersiva zêde dide dijî nexweşiyekê, û ev bersiv dest pê dike ku avahî û perçeyên xwe xirab dike. Ev xirabûn dibe ku gelekî zor be ku bibe sedema mirinê. Sepsîs, û mirina ji ber sepsîsê, dikare gelek bi lez bibe.

Mirina zarokê we gelek wêranker e. Em qebûl dikin ku xemgîniya ku hun dikişînin ne wek ti carî ye. Fahmkirina tiştên bi serê zarokê we hatine û zanebûna ku kî dikare alîkariyê we bike girin e.



### Fahmkirina tiştên bi serê zarokê we hatine

Tîma tendûristiyê ya zarokê we dê bi we re li ser teşhîsa sepsîsê û bûyerên ku rê li ber mirina wan vekirine bipeyîve. Gelek caran tê dîtin ku hun van agahîyan fehm nekin an jî ji bîr bikin. Ev yek ji ber trawma û xemgîniya we ye. Dibe ku hun bixwazin bi we re bibin xwedî destek. Wek hevalek an jî xebatkarê civakî, ji bo têbînan ji bo we bigrin an jî pirsan bipirsin.

Her wiha hun dikarin di demeke din de bi tîma tenduristiyê ya zarokê xwe re biaxivin da ku li ser lênihêrîna ku ji wan re hatiye dayîn nîqaş bikin û bê ka li ser mirinê çi tê zanîn.

### Pirsên ku hun dikarin ji tîma tenduristiyê ya zarokê xwe bipirsin

- Zarokê min çawa bi sepsîsê ewqas nexweş bû?
- Gelo ez dikarim bi bijîşkekî re li ser tiştên ku di demên din de qewimîn biaxivim?
- Eger zêdetir pirsên min hebin, kesê min ê sereke yê têkilîyê yê li nexweşxaneyê kî ye?
- Piştî ku ez ji nexweşxaneyê derkevim dê zarokê min li ku bê xwedîkirin?
- Ez çawa dikarim bi zarokên xwe yên din re li ser mirina xwîşk/birayê wan re biaxivim?
- Piştî ku em ji nexweşxaneyê derketin kî dikare destekê bide me?

SEPSIS www.childrens.health.qld.gov.au/health-a-to-z/sepsis

Queensland Government

Herî dawî Cotmeha 2024an hatiye nû kirin BK0013

## Piştgiriya ji bo we û malbata we

**Bernameya Sepsîsa Zarokan a Queenslandê (QPSP)** ji bo dê û bavên ku zarokê wan ji sepsîsê jiyana xwe ji dest daye piştgirî û agahîyê pêşkêş dike.

Hun dikarin vê kodê ji bo Bernameya Piştgiriya Malbatê bi kar bînin. Malbat dikarin her demê ku xwe amade hîs dikin de qeyd bikin, wexteke taybet nîne. Yek ji xebatkarên me yên civakî yên bi tecrûbe wê paşê bi we re bikeve têkiliyê.

Xizmeta Xemgîniyê ya **Tenduristiya Zarokan a Queenslandê** jî alîkariyê dide hemû malbatên ku zarokê wan li Queenslandê de miriye. Ji bo zêdetir li ser piştgiriyê bizanibin, hûn dikarin telefonî wan bikin li ser hejmara **1800 080 316** an jî îmêlekê ji wan re bişînin li ser **chq_bereavement@health.qld.gov.au**

## Alîkariya kultûrî

Heger pêdivîya we pê hebe, tîma xwe ya tenduristîyê agahdar bikin:

Wergêrê nivîskî an jî wergêrê devkî.

Karkerê Peywendiyê ji bo kesê Aborjînal û Xelkê Girava Torres Strait.



## Alîkariya zêde ji bo xemgîniyê û windabûnê

- Beyond Blue **1300 224 636**
- Red Nose **1300 308 307**
- 13YARN **13 92 76** – ji bo Kesên Aborîjînal û Xelkên Girava Torres Strait